

Hevpeyvîn bi mamoste Zerdeşt Mustefa -Endamê Encumena giştî ya (DAD)ê- re

Hevpeyvî:Nûşîn Bêcirmanî

Mamoste **Zerdeşt Mustefa** ,bi navê weşana **NEWROZ**, em xêhatina we dikin, dilxweşin ku di vê hevpeyvînê de, hun armancên saziya DAD ê, çalakiyên wê ji xwendevanên me re şirove bikin. Hun gelekî bi xêr hatin.

P1-ji kerema xwe re, xwe ji xwendevanê Newrozê re bide naskirin?

B1-Ez **Zerdeşt Mustefa Mustefa**, endamê encumena giştî ya (DAD)ê me ,ji 20 salan ve ez avokatiyê dikim, em ji xizmeta gelê xwe yê kurd re amade ne. Ez ne siyasetmedar im, ango ez di ti partiyên tevgera kurdî de kar nakim, lê ez ne dûtî wa me jî, rêz û hurmeta min ji hemiyar re heye, ji ber dema mirov nêzîkî doza gelê xwe be, wê wilo jî ciyê rêz û hurmetê be, min 3 zarok hene, kurek û 2 keç, ez ji daxwazkerên sînordanîna dîndê me .

P2-ji kerema xwe, hun dikarin hinekî ser **DAD** ê ji me re bipeyivin ?

B2-Belê, navê saziya **DAD** ê (Saziya kurdî ya Berxwedana Di ber Mafên Mirovan û Azadiyên Giştî li Sûriyê) ye. Em serbixwe ne, ne girêdayî bi tu partiyên tevgera kurdî ve ne, em rêz û hurmeta hemiya digrin, karê me venêrtina dadana mafê mirovan li Sûriyê û belavkirina çanda mafê mirova ye, li ba me, Kurdistan xêzek sor e, ango çênabe em erîşe berdin wê. Di van du salên dawî de, me raporek li ser dadana ser mafên mirovan li Sûriyê sala 2006an derxist û me pirtûkek bi navnîşanê (Jin di yasayên Sûriyê de) belav kir. Rapora me ya sala 2007 an ji

belavkirinê re amade ye. Pere û diravê me, ji ba me ne, em arîkariyê ji tu kesî nastênin. Em êşkere ne, 4yan 5 ji endamên partiyêna tevgera Kurdî bi me re ne, ew ji Azadî , Yekîtiya Demoqrata, Wekhevî û hin dî ne. Da em bi ti partiyan ve neyêne girêdan, biryarek li ba me heye, çî endamê DADê nabe ew di tu saziyên din de kar bike. Herweha pêşinyareke din jî heye ku çênabe endamê partiyên tevgerê di seroktiya DADê de be, ji ber em dibînin ku em ne li şûna partiyan e û ew nûnerê gelê kurd li Sûriyê ne. Ya din jî em daxuyanekê bi tek partiyê re dernaxin, lê belê çî daxuyana ku tevger bi tevayî derêxe, em jî bi wan re imze dikin.

P3- Gelo ev saziya we, bi mafê gelê kurd tenê ve girêdayî ye, yan bi tevaya miletên Sûriyê ve ye?

B3- saziya me ji navê wê xuyaye ku saziyeke kurdî ye, lê çî dadan li ser mafê mirovan li Sûriyê têne kirin, bêyî em zanibin çî kes in, Fille, Misilman, Ereb, yan jî Kurd, em bi wan ve diçin û li ser wan dinivîsin, tenê endamê saziyê divê kurd be û baweriya wî bi doza kurdî di sûriyê de hebe. Wek nimûne, em yekî(BEESÎ) nakin endamê saziyê eger kurd be jîm, ji ber baweriya me bi partiya(BEES) nayê. Ji sala 1963an û ta niha, wan berê Sûriyê û miletê wê ne birine bal bi xweşiyê ve, (Yasayên awrte, Dadgehên leşkerî ..û hwd).

P4-Ji bo rawestandina dadanên ser mafên mirovan li Sûriyê, hun çî şeweyên kar û xebatê pêktînin?→